

## **Erdogan vê carê jî bi dengên kurdan xwe xelas kir – tifaqa digel MHP-ê hîçûpûç bû**

BRUKSEL, 18/4 2017 — Di referanduma guhortina 18 madeyên qanûna esasî ya Tirkîyeyê de serokkomarê Tirkîyeyê Recep Tayyip Erdogan û partiya wî AKP-ê bi xêra ”nîv mîlyon” dengên nû yên kurdan xwe xelas kir û encama referandumê bi % 51.4 erê û bi % 48.6 nexêr xelas bû.

Li seranserê Tirkîyeyê û bakurê Kurdistanê hîç faydeyekê AKP-ê û Erdogan ji tifaqa digel MHP-ê û Devlet Bahçelî çênebû. Ji nêv AKP-ê bi xwe jî hinek dengên nexêr hebûn ji ber AKP-ê li gor hilbijartinên 1/11 2015-ê dengên xwe li aliyê tirkan kêr kir û dengên xwe li aliyê bakurê Kurdistanê zêde kir.

Li keleha Erdogan li Stenbolê dengên ”nexêr” ji dengên ”erê” zêdetir bûn û ji % 51.4 xelkê Stenbolê yanî 4.7 mîlyon kesan got ”nexêr” ji Erdogan û guhortina qanûna esasî re û ji % 48.6 yanî 4.4 mîlyon kesan got ”erê”.

Li paytexta Tirkîyeyê li Enqereyê jî dengên ”nexêr” ji dengên ”erê” zêdetir bûn û ji % 51.2 xelkê Enqereyê yanî 1.7 mîlyon kesan got ”nexêr” ji Erdogan û guhortina qanûna esasî re û ji % 48.8 yanî 1.6 mîlyon kesan got ”erê”.

Li wîlayetên Tirkîyeyê yên wekî Eskîşehîrê û li hemî wîlayetên Trakyayê, li hemî wîlayetên Egeyê û li hemî wîlayetên Deryaya Spî jî dengên ”nexêr” ji dengên ”erê” zêdetir bûn.

Li gelek wîlayetên bakurê Kurdistanê ekseriyeteka xurt ji bo ”erê” dengê xwe da. Bo nimûne:

Mereş:	% 74
Meletî:	% 69.6
Sêwas:	% 71.3
Erzirom:	% 74.5
Entab:	% 62.5
Ruha:	% 70.8
Elezîz:	% 71.8

Li wîlayeta Diyarbekirê AKP-ê û Erdogan ji bo ”erê” 70 hezar dengên nû wergirt.

Li wîlayeta Ruhayê jî AKP-ê û Erdogan ji bo ”erê” nêzikî 70 hezar dengên nû wergirt.

Dema ko em li netîceya dengên ”erê” yên 25 wîlayetên bakurê Kurdistanê temaşa bikin em dibînin ko ji bilî Kîlîsê, AKP-ê û Erdogan dengên xwe li hemî wîlayetan zêde kirine û li gor 2015-ê hema bibêje 480 hezar dengên nû bi dest xistine. Yanî vê carê jî kurdan Erdogan ji têkçûneka mezin xelas kir û Erdogan û AKP deyndarên milletê kurd in.

**Referandum, 16/4 2017**  
**Nisbeta dengan li 25 wîlayetên bakurê Kurdistanê**

	erê	nexêr	erê %	nexêr %	AKP-2015
Mereş	458.349	161.395	74	26	441.137
Meletî	323.638	141.539	69.6	30.4	315.492
Sêwas	262.404	105.730	71.3	28.7	262.205
Erzîncan	80.903	52.816	60.5	39.5	76.989
Erzirom	300.589	103.007	74.5	25.5	281.706
Erdexan	23.455	29.529	44.3	55.7	20.559
Qers	70.920	68.189	51	49	52.454
Îdir	30.817	57.736	34.8	65.2	30.218
Agirî	87.257	115.271	43.1	56.9	60.890
Mûş	87.314	85.370	50.6	49.4	64.599
Kilîs	44.461	24.912	64.1	35.9	44.980
Entab	603.954	363.136	62.5	37.5	594.689
Adiyeman	230.176	99.781	69.8	30.2	227.042
Ruha	599.073	246.835	70.8	29.2	531.260
Elezîz	240.774	94.620	71.8	28.2	224.560
Diyarbakir	251.733	525.089	32.4	67.6	181.428
Dêrsim	9.859	40.478	19.6	80.4	6.611
Mêrdîn	149.733	215.653	41	59	113.669
Batman	96.139	168.376	36	63.7	77.726
Bîngol	95.987	36.273	72.6	27.4	85.495
Şirnex	58.607	148.482	28.3	71.7	27.147
Hekarî	41.104	85.689	32.4	67.6	19.333
Sêrt	68.121	74.365	47.8	52.2	53.584
Bitlîs	87.852	60.170	59.4	40.6	67.662
Wan	193.584	259.575	42.7	57.3	149.796
<b>Kom</b>	<b>4.496.803</b>	<b>3.364.016</b>			<b>4.011.231</b>

Vêca heger em analîza netîceya referanduma guhortina qanûna esasî ya Tirkiyeyê bikin ev nuqte pir zelal xuya dikin:

1. Tifaqa digel MHP-ê hîç fayedeyek neda Erdogan û AKP-ê.
2. Muxalefeta Erdogan û AKP-ê di nêv tirkan de gelek xurt e û herçend HDP li dijî Erdogan jî bû cardî Erdogan bi dengên kurdan ji têkçûnê xelas bû.
3. Di hîlbijartinên nû yên serokkomariyê û parlamantoyê de (2019) muxalefeta Erdogan û AKP-ê ya di nêv tirkan de dikare bi tifaqa digel HDP-ê desthilata dewletê ji Erdogan bistîne û bi van desthilatên nû yên serokkomariyê malikê li Erdogan û AKP-ê bişewitîne.

4. Ji îro û pê ve ihtimala ko partiyên tirkan li hemberî kurdan li hev bikin gelek kêma e û her partiyeka ko bixwaze bi serê xwe bê ser desthilatê mecbûr û muhtaca dengên kurdan e. Yanî HDP jî û hêzeka siyasî ya nû ya kurdan jî dikare berî hilbijartinan bazareka xurt digel AKP-ê yan CHP-ê bike û li gor berjewendiyên kurdan, pêşwext hinek tiştan li partiyên tirkan bide qebûl kirin û bibe şirîka hikûmeta ko dê paşê bê avakirin.
5. Erdogan her ji niho ve dixwaze piştgiriya kurdan bo xwe wekî piştgirî bo “yekîtiya axa” Tirkiyeyê, piştgirî bo “sedaqeta” bi dewleta Tirkiyeyê re û piştgirî bo “alaya” Tirkiyeyê rave bike. Ev ravekirina wî gelek şaş e ji ber kurdan ji destpêka avakirina komara Tirkiyeyê ve hertim dengê xwe dane partiyên ko dixwazin guhortinan di sîstema dewleta Tirkiyeyê de çêkin. Yanî kurdan dengê xwe da guhortinê û neda Erdogan.
6. Kurd têra xwe ji vê dewletê bêhêvî bûne û heger Erdogan tifaqeka jidil digel kurdan neke û bi rengekî desthilata herêmî ya kurdan xurt neke ew nikare hêdî wekî “tirkekê binyatgircî” li pêla “nasyonalîzma tirkan” siwar bibe û hukumdariya tirkan, kurdan û Tirkiyeyê û bakurê Kurdistanê bike.

**ARIF ZÊREVAN**

[www.nefel.com](http://www.nefel.com)